

**FEDASIL INFOPOINT**

Rue Héger-Bordet 3, Bruxelles
0800 32 746

**IBZ Registration / CUBE**

Rue Belliard 68, Bruxelles
(kolana Belliard 68, 1040 Brûkse)

**CGRS/CGRA**

Rue Ernest Blerot 39, Anderlecht
+32 2 205 53 05
cgra-cgvs.advocate@ibz.fgov.be

**Refugee Medical Point / CROIX ROUGE / Red Cross**

Boulevard de Waterloo 125, Bruxelles

**INFOLINE VLUCHTELINGENWERK VLAANDEREN**

+32 222 54 411 (English, Français, Nederlands, Dari, Pashto)
+32 222 54 421 (Russian, Ukrainian)
Whatsapp/Telegram: +32 489 133 355
Monday - Friday: 9.00 - 12.30

**LEGAL HELPDESK VLUCHTELINGENWERK VLAANDEREN**

QUAI AU BOIS DE CONSTRUCTION 10, Bruxelles

STARTPUNT VLUCHTELINGENWERK VLAANDEREN

GER HÛN CARA EWIL DI BELÇİKAYÊ DE SERÎ LI ÎLTÎCAYÊ DIDIN

QEYD

Roja ku hûn dê serî li penaxwaziya navnetewî (ango îltîca) bidin, dive hûn sibehê berî saet 8:30an de li Ofisa Koçberiyê (IBZ) (Navnîşan: Bûlwara Rue Belliard No: 68) bin. Di rojên gura hî zêde de, hemû kesên ku serî lê dayî dê nekaribin qeyda xwe bikin. Ger qeyda we wê rojê neyê kirin, ji bo ku hûn demekî din yê diyarkirî de werin, randevûyek dê ji we re bê tayînkirin û bangnameyek dê ji were bê şandin. Ger hûn bangnameyê dest bi nexin, divê hûn roja pêştir (ango ji yekşemê heta îne) dîsa werin ofîsê.

Gava hûn ketin hûndirê navenda qeydê de, ewilî hûn dê ji kontrola ewlehiyê derbas bibin. Paşê agahiyên we yê gelemperî (nav, paşnav, welat, dîroka jidayikbûnê, zimanê hûn diaxivin) dê ji we bên xwestin. **Hay jê hebin ku we zimanê ku hûn herî baş dizanin û diaxivin gotiye;** bi vî awayî di hevdişinê we yê pêşdetir de wergêrrekî/ê zimanê we yê zikmakî dizanê, dê bê tayînkirin. Ger hûn bixwazin, ji bo wergêr hûn dikarin kesek jin an mêr daxwaz bikin.

Wênayekî we dê bê kişandin; Ev wêne dê bê tê xistin di nava belgeya Annex 26

(Bijlage 26) de, ku ev belgeya fermî ye ku nîşan de hûn li Belçîka ne. **Kontrol bikin ka agahiyên we yê şexsî yê di belgeya Annex 26 de rastin an na.** Ger agahiyên xelet hebin, di cih de karmendê IBZê dê wan rast bike. Egerna, dîsa jî, hûn dê di hevdişina we ye ewil de dê bikaribin agahiyên xwe bidin guhertin.

Hay jê hebin ku we belgeya xwe ya Annex 26 bi awayekî baş hilanî û veşartî ye. Û serde jî, an bila kopiyeka we li ba we hebe an jî bila wênayê wê li telefona we de tomakirî be.

HÊWIRÎN

Wekî penaberekî/ê, di hemû pevajo ya prosedûra îltîca we de, hûn xwedî mafê hêwirîn û standina xizmeta tendiristiyê ne. Lê, ji ber kemasiya cihên hêwirînê;

BELÇÎKA NIHA CIH NADE MÊRÊN EZEB (ANGO YÊN NEZEWICÎ), YÊN KU SERÎ LI ÎLTÎCAYÊ DAYÎ.

Her çiqas cihê we yê hêwirînê tune be jî, heta ku serlêdana we ya îltîcayê kuta bûyî, hûn xwedî maf in ku bêpere sîd werbigirin ji alikariya parêzer, alikariya psikolojîk û alikariya bilez a tibî.

HEVDITÎN

Hevdîtina IBZê

Hûn dikarin di belgeya xwe ya Annex 26 de dîroka **hevdîtîne ya ewilî** bibînin.

Li gorî rewş, şert û mercên we, heye ku hevdîtina we ya ewilî du-sê rojan de jî, du sê mehan de jî çêbibe. Parêzerekî/ê bêpere dikare alîkarî bide we ku hûn xwe amadeyî hevdîtîne bikin, lêbelê, ew dê di hevdîtina we ya ewilî de ne li cem we be. Tenê wergêrê we ye li cem we be. Ger di dema hevdîtina we de pirsgrêkên wergerê çêbibin (wek mînak: hûn wergêrê baş fehm nekin an jî hûn bifikirin ku gotinên we rast wernagerîne), jî nişka ve vê rewşê jî karmend re bibêjin.

Li dema hevdîtîne de, nasnameya we, rê ya ku hûn pê re hatin Belçikayê û sebeba jiderketîne ya ji welatê we, dê ji we bê pirsîn. Divê hûn hemû delîl û belgeyên ku serlêdana we piştrast dike, amade bikin. Herwiha, divê hûn derbarê

sebebên revîna we ya ji welatê we û hûn çima nikarin vegerin de, çîrokeka rastî û lihevkerî bibêjin. Serde jî, divê hûn rast bibêjin ka hûn bi çî rê û rotaya re hatin Belçikayê.

Karmendek dê raporekê ji bo hevdîtina we binivîse; hûn xwedî maf in ku bi wergêrê xwe re vê raporê kontrol bikin û ger xeletiyek hebe, wê xeletiyê rast bikin.

Gelekî muhim e ku hûn herin vê hevdîtina ewilî. Ger hûn neyên, divê di dema herî nêz de hûn bi telefon an e-mailên jêr de nivîsî xeber bidin IBZê û daxwaza dîrokekê nû ya hevdîtîne bikin.

Telefon: 0032/2488.80.00

E-mail:

NL: asiel.interviews@ibz.fgov.be

FR: asile.interviews@ibz.fgov.be

Prosedûra Dublinê (Doza Rê)

Ger we li welatekî din a YE (Yekîtiya Ewropayê) şopa tiliyên xwe dabe an serî li îlticayê dabe, an jî ger vîze an îqameya we li welatekî din a YE hebe, heye ku Belçika berpirsiyariya serlêdana îltica we hilnegire. Wê gavê serlêdana wê dê di çarçoveya **Rêzîknameya Dublinê** de bê nirxandin. **Wê demê, dîroka li ser belgeya we ya Annex 26ê de dinivîse, dîroka hevdîtina Dublinê ye.** Dê ji we bê xwestin ku hûn vebêjin ka çima we serlêdana îlticayê ne li welatê ku we ewilî şopa tiliyan dayî, neda, lêbelê we serî li Belçikayê da.

Ger hûn bikevin hevdîtina Dublinê de, hin mijarên muhim ev in:

- Divê hûn vebêjin ka çima divê Belçika ji îltica we berpirsyar be (wek mînak: IBZê agahdar bikin ger kesek ji malbata we hebe ku li Belçika dijî, ango hûn bixwazin xwe bigihînin wan kesên ji malbata we; delîlê piştrast dike bidin IBZê ku li welatê we şopa tiliyan dayî, we mîameleyeka nebaş ditiye; ger nexweşiyek an jî pirsgrêkeka we ya tendiristî hebe, belge û delîlên xwe vê yekê piştrast dike, bi xwe re binin)
- Dê ji were baş be ku hûn alîkarî ji parêzerekî/ê bistînin ku ew we agahdar bike û ger hûn hewce bin alîkariya hiqûqî bide we.

NAVNIŞAN

Ger tu cihê hêwirîne an jî navnişaneka we tune be, hemû postayên derbarê doza we de (mînak: bangnameya ji bo hevdîtîne, biryar) dê ji CGVS/CGRAYê re bê şandin. Divê hefteyê du caran hûn bi telefon +32 2 205 53 05 û bi mailê (cgra-cgvs.advocate@ibz.fgov.be) kontrol bikin ka postayeka nû ji bo we heye an na.

Serde jî, da ku hûn postayên xwe bi xwe bistînin, hûn dikarin di nava saetên şixul de herin CGVS/CGRAYê (Navnişan: Ernest Blerotstraat 29, Brûksel).

Hevdîtina CGRA/CGRSê

Ger Belçika berpirsiyariya serlêdana we bistîne, hûn dê bi rêya postayê bên dawetkirin ji bo hevdîtina bi Komîsyona Giştî ya Berpirsyarê Penaberan (CGRA/CGRS) re. Muhim e ku hûn ji bo vê hevdîtîne bi parêzer û asîstanê civakî yê xwe re amade bibin; divê hûn bi parêzerê xwe re tevlî vê hevdîtîne bibin.

Divê agahiyên hûn bidin, rast û bi hevdîtina we ya ewilî re lihevhatî bin.

Pir muhim e ku hûn herin vê hevdîtina bi CGRSê re. Ger ji ber hin rewşên awarte

hûn nekarin tevlî hevdîtîne bibin, divê ji dîroka diyarkirî ya hevdîtîne pê de herî zêde nava 15 rojan de hûn bi nameyeke CGVS/CGRAYê (Navnişan: Ernest Blerotstraat 39 1070 BRUSSEL) agahdar bikin.

Biryar

Ger hûn biryareka erênî dest bixin, hûn dê bibin xwedî mafê îqameyê li Belçikayê. Ger hûn biryareka neyînî dest bixin, bi alîkariya parêzer hûn dikarin nava 30 rojan de îtiraz li biryarê bikin.

GER EV LI BELÇIKAYÊ NE SERLÊDANA WE YA EWILÎ YA ÎLTICAYÊ BE

Ger serlêdana we ya berî vê hatibe redkirin, hûn dikarin serlêdaneka nû bikin lê divê hûn hin tiştên nû li serlêdana xwe zêde bikin.

Hûn dê ji heman pêvajoya serlêdanê re derbas bibin û belgeya Annex 26 “quinquies” bistînin. Mafe we dê hebe ku we parêzerekî/a belaş hebe û hûn alîkariya psikolojîk û alîkariya bilez a tibî bistînin. Lêbelê, heye ku mafê we yê hêwirîne ji destê we biçe. Ger pêdiviya we li hêwirîne hebe, di dema herî nêz de li parêzerê/a re xwe bişêwirin ka hûn dê bikaribin îtiraz bikin an na.

Hevdîtin

Di hevdîtina we ya IBZê de, jê emîn bin ku we hêmanên nû dayîne, ku divê we berî niha ew nedayîbin (Wek mînak: belge, delîl, guherîna di rewş we an jî welatê hûn jê hatin de). Ger CGVS/CGRA van hêmanên we yên nû qebûl bike, doza we yê ji nû ve bê nirxandin. CGVS/CGRA dê bi rêya postayê agahî bide we. Jê emîn bin ku hûn her tim navnişana xwe ya dawîn bi name an jî bi şexşî radigihînin IBZ and CGRSê. Hûn dê paşê biryarê bi rêya postayê bistînin. Ger serlêdana we bê redkirin, mafê we heye ku hûn di nava 10 rojan da, bi alîkariya parêzerê xwe îtiraz bikin.